

## Pirs û Bersiv: Bernameya Qomîseriya Bilind a NY (UN)ji bo Penaberan a ji bo xaniyan (Otel & Xanî)

### Adar 2017

#### 1. Çima ez li otêl an jî li avahiyê dimînim û çima ez li xanî namînim?

Sê ciyê ku Qomîseriya Bilind (UN) ku piştgiriyê dike hene:

- Xanî
- Otel
- Navendên muşterek an jî «avahî»

Armanç eve ku zêdetir kes li xaniyan werin bi cîh kirin, li gorî ciyên mawcûd û li gorî hewceyiyên taybetî , wek rewşa tenduristiyê, temen-emir, zayendî û li gorî mezinbûna malbatê . Dema ku ciyên mawcûd hebin , Qomîseriya Bilind(UN) û saziyên hevkarê bi wê re pêşiyê xaniyan li navendên bajaran li gorî derfetên xwe dibîne. Vê gavê cî li xaniyan ji bo herkesî tune ne.

#### 2. Çima li Atîna xanî nadine min?

Ciyê ku xanî lê mawcûd hebin wê bidine we.

Hemî biryarên vecihîkirinê (relocation) li Atîna tîn dayîn. Ji ber vê sebebê , berendamên ji bo vecihîkirinê (relocation) , piştî girtina biryarê , ji bo ku pêvajoyan bişopînin û biçin randevûya xwe li Atîna tîn bi cîh kirin, wek kontrola tenduristiyê û wek îstiqameta çandî. Ji ber ku cîh li Atîna kêmin, mimkûne veguhestina we a ji bo Atîna bi derengî bikeve.

#### 3. Çima otel an jî xaniyê min ewqas ji navenda bajêr dûr in ?

Armanca me ewe ku em xaniyên ji bajêr nêzîkin peyda bikin, ji bo ku mesrefên veguhestinan û mesrefên xizmetên din kêmtir bin. Heta ji dest me tê em dixwazin ciyên werin dagirtin zêdetir bikin ,lê ciyên vê gavê mawcûdin hindekin. Û dîsa em ji bo pêdewiya we a ji bo xaniyan, wek rewşa we a tenduristî, temen-emir, zayendî û mezinbûna malbatê digrin ber çavan.

#### 4. Yekî ku xaniyekî nêzîkî bajêre bidi min ez nasdikim heye. Ez kanim li wir bijîm ?

Eger we xanîkî din li dereke din dît,hun serbestin/û dîsa hun kanin ji xaniyên ku Qmiseriya Bilind(UN) piştgirî dide jî derkevin. Ji kerema xwe re saziya ku ve gavê ciyê ku hun lê nin ji bo biryara ku we girtiye agahdar bikin.

Eger hun werin veguhestin, ji bo ku hun alîkariya aborî ji bo hewceyiyên xwe ê rojane bigrin , eger hun kanin herin cem saziya ku vê gavê lînin.

Eger hun ji xaniyên Qomîseriya Bilind(UN) û saziyên hevkarên wê derkevin, xaniyê ku hun lê diman wê bidine yekî din.

#### 5. Heta ku ez li xaniyên Qmîseriya Bilind (UN) im mesrefên çûyin û hantina min tîn dayîn ?

Qomîseriya Bilind (UN) û saziyên hevkarên wê mesrefên çûyin û hatina we a şexsî nadin. Ev mesrefana ji alîkariya aborî ku hun digrin ,ji wir tîn temînkirin.

- **Si vous êtes dans un hôtel ou un appartement à Athènes ou Thessalonique et que vos rendez-vous ne nécessitent pas de grands déplacements,** le HCR ne



couvre pas les tickets pour votre déplacement vers et depuis le lieu de vos rendez-vous officiels au Service d'asile. C'est vous qui devrez assurer vos besoins de transports locaux, grâce à l'aide mensuelle que vous recevez.

- **Eger hun li otêl an ji li xaniyên derveyî Atîna û Thessalonîkî dimînin**, û randevûya we a fermî ji bo Xizmetên Îlticayê , balyozxane-sefaretan an jî nexwaşxane çûyin û hatina wan dût e, Qomîseriya Bilind (UN) bi saziyên hevkar ku ji bo ciyê we berpirsiyare, wê ji bo veguhestina we alîkariyê bike. Gerek hun bi berpirsiyarê mesela xwe an jî bi şewirmendê civakî re bikevin têkiliyê û agahiyên zêdetir bigrin.
- Eger biryara Xizmetên Îlticayê we girtiye û li gorî vê biryarê **hunê werin veguhestin welatekî din bi rê ya bernameya vecihîkirinê (relocation)**, wê ji bo veguhestina we awelatekî din IOM alîkariyê bide we.
- Eger biryara Xizmetên Îlticayê we girtiye û li gorî vê biryarê **hunê bigîhjin endamê malbata xwe a li welatekî din** (li gorî qanûna Dublînê) eger çûyina we ji aliyê Xizmetên Îlticayê da hatiye programkirin Qomîseriya Bilind (UN) kane alîkariya we bije ji bo veguhestina we a vî welatî.

#### **6. Têkiliya saziya ku xizmetên xaniyan diki bi Qomîseriya Bilind (UN) re çiyê? Ez kanim vê saziya ku xizmetên xaniya dike bidim guhertin ?**

Qomîseriya Bilind (UN) ji saziyên cûde xwast ku piştgiriyê bidin ji bo xaniyan û xizmetê bidin ji bo daxwazên îlticayê li Yûnan ku li derveyî bajaran «li derveyî-navendên mêvanxana» dimînin bikin. Ev hemî saziyên ku li ciyên mêvanxana û xaniyan xizmetê didin , li ser navê Qomîseriya Bilind(UN) kardikin. Li bendenin ku ev sazî va xizmetanan bikin, ev sazî hevkarîyê bi Qomîseriya Bilind(UN) re dikan û li gorî lihevhatinan û li gorî siyaseta bernameya Qomîseriya Bilind(UN) tev digerin. Heta ku cî kêmbin û ne mevcûd bin wê xanîkî din ninikibin bidine we.

#### **7. Ez kanim vegerim li wargeha ku berê ez dijîm ?**

Li hindek wargahan mimkûne cî hebe, lê biryara ku va ciyê ku hene, rayedarên Yûnan û îdareya wargehê didin. Pêşiya ku yekî bigrin wargeha ku dewlet jê mesûle, lazime berpirsiyarê wargehê bi КЕΠΟΜ ( Navenda ji bo kar û barên penaberan) bişewirin. Rayedarên Yûnan nahêlin û qebûl nakin veguhestinên bi serê xwe di nav wargehan da, û mimkûne cî neyê dîtin .

Eger hun dixwazin vegerin wargeha xwe a berê , lazime hun bi berpirsiyarê mesela xwe an ji bi şewirmendê civakî re bikevin têkiliyê, ew kanin zêdetir agahiyan bidine we. Dîsa ku hun ciyê xwe berdin û biçin, ji bo vegera we wê cî neyê hildan.

#### **8. Kêfa min ji xwarinê otelan re nayê. Ez kanim ji bo xwe xwarinê çêbikim ?**

Eger hun li otelan in û xwarinê îdare dide we, hun nikanin li oda xwe xwarinê çêbikin. Lê ji bo şert û mercên xanî û warinê xwêştir bibin her roj kar tê kirin. Xaniyên bi ciyê ku aşxane lê henin gava ku mevcûd bin wê bên dayîn.

Gerek hun zanibin ku, li gorî qanûnên Yûnan mirovên ku îzin destûra wan tune be nikarin xwarinê ji bo xelkê çêkin û dîsa ji bo sebebên ewlahiyê û tenduristiyê aşxane li odê otêlan çênabin.



### **9. Wi-fi baş kar nake û ne bi hêz e. Hun kanin çêbikin ?**

Mecbûretiya xwediyê otêlê an jî xwediyê xaniyan û ne jî mecbûretiya saziya ku xanî daye we tuneke ku ji wecre wi-fi peyda bike. Lê dîsa jî Qomîseriya Bilind(UN) û hevkarên wê tiştên ku ji dwstê wan were wê bikin, ji bo ku li otel û avahiyan ku hevpeyman bi Qomîseriya Bilin (UN) re çêkiriye şebeke hebe. Lê di vê navberê da ji bo mesrefên têkiliya we hun kanin ji alîkariya aborî ku digrin temîn bikin.

### **10. Mesrefên tîbbî pirr buhane alîkariya ku ez digrim qîm nake. Ez kanim zêdetir alîkariyê bistînim ?**

Alîkariya ku hun digrin lazime mesrefên we temîn bike. Ev alîkariya aborî ku tê dayîn ne ji bo tedawiyan taybet, dermanên buha, nexweşiyên bi salan, nexweşiyên giran, emeliyat , seqetî û zarok anînê ye. Eger hewceyiyên we û mesrefên tîbbî yê bûha çêbûn, mimkûne hun alîkariya zêdetir heq bikin. Di vê rewşê da bi personelên Qomîseriya Bilind(UN) an ji saziya ku xanî ji we re dîtiye re bikevin têkiliyê ka wê alîkariya zêdetir bidine we an na.

### **11. Alîkariya aborî ku ez digrim qîmî malbata min nake. Ez kanim zêdetir alîkariyê bigrim ?**

Qomîseriya Bilind(UN) , Wezaretê Karûbarên Penaberan û saziyên hevkar bihevra kar dikin ji bo ku li wargehan û li avahiyan xizmet were kirin û ji bo ku mirovan veguhezînin şertên jiyaneke hîn xweştir. Bernameyên alîkariya aborî ji bo ku kesên li wargehên mêvanxanê vekirî û kesên ku li wargehên bajaran dimînin li gorî mezinbûna malbatê û li gorî dayîna xwarinê li va ciyan tê bi kar anîn. Alîkariya aborî ku tê dayîn gerek ji perê bernameya piştgiriya civakî a dewleta Yûnan ku dide hemwelatîyên xwe derbas neke. Hemî saziyên ku alîkariya aborî li wargehên cûde û bernameyên mêvandariyê eynî ne.

### **12. Xanî pirr mezin an jî piçûke, an jî ji heval û malbata min dûre. Hun kanin bidine guhertin ?**

Gava ku xanî didine we li gorî hewceyiyên we didin we, li gorî netewatiya we, zayendî, mezinbûna malbatê û hwd. Ev ciyê ku ji bo we hatiye dayîn ciyê herî baş ku em kanin bidine we ye.